# HUN BI XÊR HATIN BEXÇEYÊ ZAROKAN LI LARVIK

Di vê broşûrê de, hûnê bi kurtî li ser bexçeyê zarokan agahdariyan bistînin, û hinekî jî li ser tiştên ku hûn wek zarok û dêûbav dê di bexçeyê zarokan de rastî wan bên. Bexçeyê zarokan cîhê xweşî, hevaltî, guhdanê û pêşveçûnê ye. Hema bêje hemû zarok beriya temenê dibistanê li Norwêcê diçin bexçeyê zarokan. Hemî çalakiyên li baxçeyê zarokan li gorî Qanûna Baxçeyên Zarokan tên tenzîm kirin.

*Lîstin û fêrbûn*
Zarok wê bi lîstina bi kesên din re li bexçeyê zarokan şa bibin. Di lîstikê de zarok hevaltiyê bi zarokên din re dikin û di nava civaka civakî de cih digirin. Her wusa, lîstina bi zarokên din re ji bo pêşketina ziman û fêrbûna Norwêcî pir girîng e. Ji bo ku her kes beşdarî lîstikê bibe divê bexçeyê zarokan amadekariyan bike.

*Zarokên pirziman*
Zanîna çend zimanan, hem ji bo zarokan hem jî ji bo civakê îmkaneke mezin e. Divê karmend piştgiriyê bidin û zimanê dayikê yê zarokan nas û qebûl bikin, di heman demê de divê ew jêhatîbûna zimanê Norwêcî li cem zarokan bi pêş bixin û pêşve bibin. Dema ku zarok di heman demê de du zimanan fêr dibe, wê baş be ku bexçeyê zarokan û dêûbav bi hev re hevkar bin, weku mînak dêûbav û zarok li malê bi hev re bi zimanê(n) dayikê li ser tiştên ku bi zarokan re li bexçeyê zarokan çêdibe biaxivin. Zêdetir li ser mijarê di kurtepirtûka, *Zarokên di malbatên pirzimanî de* (Barn i flerspråklige familier) bixwînin. Kurtepirtûk bi gelek zimanan, hem nivîskî û hem jî bi deng heye.

Planên ji bo xebata li baxçeyê zarokan
Hemî baxçeyên zarokan planên xwe yên salane hene, ku ji dêûbavan re tên şiyandin. Plana salane li ser bingeha plana neteweyî ya baxçeyên zarokan tê çêkirin: Plana neteweyî ji bo baxçeyên zarokan. Planên heftane û planên mehane jî pir caran têne çêkirin. Di planan de tê ravekirin ka baxçeyê zarokan çawa dixebite da ku ewlekariyê û guhdanê bide zarokan, û ew çawa lîstik û fêrbûnê hêsan dike. Li hemû baxçeyên zarokan xebatkarên perwerdekirî hene ku dê kar bikin da ku baxçeyê zarokan xizmeteke baş û birêkûpêk ji zarokan re misoger bike.

Parastina sirriyetê
Li ser karmendên bexçeyê zarokanyê wacibê parastina sirriyetê heye. Ev tê wê wateyê ku karmend nikarin agahdariyên nihênî (sirrî) li ser zarokan, malbatê û hevkarên xwe parve bikin. Binpêkirina wacibê sirryetê dibe sebeba cezakirinê. Pêdivî ye ku hemî karmend berî ku dest bi kar li bexçeyê zarokan bikin bawernameya polîs radest bikin.

Hevkariya di navbera dê û bav û baxçeyê zarokan de
Bexçeyê zarokan daxwaz dike ku hevkarî bi dêûbavan re baş be. Bexçeyê zarokan pir dixwaze bizane ka ji boyî zarokê çi girîng e li gorî we dêûbavan. Axaftina rojane bi karmendan re di dema anîn û birina zarokan de girîng e. Her wiha bexçeyê zarokan civînên cuda li dar dixe û li ser naverok û awayên xebatê yên bexçeyê zarokan agahiyan dide. Hin civîn ji boyî hemû dêûbavan in, û hin jî di rengê axaftinên cuda de ne ku bi dêûbavên her zarokekî re tên kirin. Di civînên weha de, dêûbav dikarin nêrînên xwe li ser xebata bexçeyê zarokan bêjin.
Dê baş be eger wextê karmend û dêûbav hebe ku bi hev re biaxivin liser ka roja zarokê li bexçeyê zarokan çawa bû. Ger pirsên we hebin, bê dudilî bipirsin.

Tercuman

Bexçeyê zarokan dikare bi rêya xizmeta tercumaniyê tercumanekî bixwaze. Ji bo ku karmend û dêûbav karibin piştrast bin ku wan baş ji hev fêm kirine, wê baş be ku ew tercuman bikarbînin.

Cil û amûr
Zarok û mezin her roj, seranserê salê, ji bo demekê li derve ne û pêdiviya wan bi cil û bergên ku li gorî her cûre hewayê ne, heye. Her zarokek refika wî a taybet di oda guhartina kincan de heye, û ew dikare kincên xwe li ser refika xwe hilîne. Li ser malpera morsmal.no bi çend zimanan li ser kinclixwekirinê di serma zivistanê de bêtir bixwînin:
https://morsmal.no/no/foreldre-norsk/2382-kle-barna-riktig-i-vinterkulda

Xwarin
Li hin bexçeyên zarokan zarok xwarina xwe bi xwe re tînin. Li hin bexçeyên zarokan yên din xwarin li bexçeyê zarokan tê amadekirin. Hingî bi giranî nan, fêkî û şînî (sebze) tên dayîn. Dê û bav ji bo vê yekê hinek pere didin. Ger bi zaroka we re alerjî (hessasiyet) hebe, an jî ji ber baweriya olî çênabe ku zarok hin xwarinan bixwe, ji kerema xwe bexçeyê zarokan agadar bikin.

Pîrozkirina rojbûnê

Pîrozkirina rojbûna zarokan ji aliyê xebatkarên bexçeyê zarokan ve, kevneşopiyeke. Çawa rojbûn tê pîrozkirin, ji bexçeykî zarokan heya yekî din tê guhertin. Zarok bi şewq li bendê ne ku rojbûna wan li bexçeyê zarokan were pîrozkirin.

Dayina pereyan
Dibe ku mafê we yê kêmkirina pereyan an wergirtina cîhekî belaş li bexçeyê zarokan hebe. Li ser malpera şaredariyê ev agahî hene:
https://www.larvik.kommune.no/barnehage/pris-og-redusert-betaling/

Girîng!: Divê dêûbav daxwaznameya kêmkirina pereyên zarokxaneyê ne derengtir ji 01.07 radest bikin, berî destpêkirina her saleke nû ya bexçeyê zarokan.

Destpêkirin
Dema ku zarok dest bi bexçeyê zarokan dike, divê dê yan bav di rojên pêşî de bi zarokê re be. Hin kardêr ji bo vê yekê betlaneya bi me'aş didin dêûbavan. Hûn dê bi rêberê perwerdehiyê re li hev bikin li ser ka gereke hun çiqasî li bexçeyê zarokan amade bin da ku zarok bi ewlehiyê bihese.

